

Dabas

SERPÊHATÎ

Dinava şaxen çandî de, pirranî di nava wêje de serpêhatî, weke ku hemberê wergera Tirkî, ji teref nivîskarên me tê bi kar anîn "bîranîn" bilî wakanivîsan, bi xurtî çavdariya dîrokê bi cih û war, dorferehî, ji bo pêşerojan ragihandin e. Serpêhatî, di nava komên xelkê de destxelatî ne. Lewra, xwedî nirxên mezin in. Mixabin ev şax jî maye di nava gotin û galgalên devkî.

Bê goman, serpêhatî ku di warê devkî de dimîne, pirraniya caran, ji nakokî û zikreşiya heyî bi lom û goman dibin. Ev destxelatî serrast namînin, dikevine warê çîrokî de. Helbet merem jî rola xwe dileyize!...

Car din mixabin, ne dûr ne nêzîk, serpêhatî di nava rewşenbîrên Kurd de kêm hatine nivîsandin û ji bo nifşen pêşerojan ne bûne destxelatî. Gelo di nava reştariya dem û demsalan de hinek nirxên veşartî mayî wê hebin? Li gorî min ev pirs wê bimîne di nava kirâse xweziyê de. Helbet, kesî bi xwezî ne rahiştiye baqê kezî!... Li vir, navê *Bedirxaniyan* car din bi yadkirinek têr gorî tê bîr anîn ku kovarên mîna HAWAR û RONAHÎ weşandine. Mîna gelek rê, rîçik û şivîleyan, di warê serpêhatiyen de jî rola xwe leyistine. Gorbihiştiyê Nureddîn Zaza, yek nimûne ye ji bo vê pêkanînê, pişt re seydayê Cegerxwîn...

Îro rewş di nava rawestandinek bê dengî û korîk de ye. Nirxên ku bûne gorîyên welatê xwe, serpêhatiyen xwe bi xwe re birin. Tu destxelatî nedane nifşen piştî xwe re. Mînaka kekê *Musa Anter*, *Şewket Turan*, *Dr. Nafiz û hwd.* dîrokêne nêzî wext bûn, tiştîn bi xwe re birin û çûn... Gelo îro, ew dîrokêni li ser lingan ku jiyana xwe di nava tevgera civaka Kurdî de didomin: *Sebrî Botanî*, *Dr. Nacî Kutlay*, *Yaşar Kaya*, *Şerafettîn Kaya*, *Serhat Bucak*, *Wezîrê Eşo û hwd.* wê tiştîn bi xwe re bi destxelatî bidin nifşen paş xwe, yan wê bikin gorî?...

Bi bexîsandina wan kesan dibêjim ku ev pêkneanîn destdirêjiyek mafê gelerî ye. Heya Îro, di nava tewanbariye derfet û wateyên rojane ku bi destên dijmin hatine, serpêhatiyen rewşenbîrên me hatine fetisandin. Komên xelkê ji destxelatiyên bi nirx bê par hiştine. Divê ku êdî ev rîh spiyêni me ku bi salan qendîtiya aqilmendî kirine serpêhatiyen xwe binivîsin. Hewceyiya pêşerojan bi wan destxelatiyan heye. Çanda cîhanê, pirranî wêjeya cîhanê bi destnivîsen, wilo xwe gihandiye qonaxa îro. Her xêzik, her rûpel, her pirtûk qezancek mezin e ji bo çanda Kurdî. Gel bê pirtûk nabe xwedî pirtûkxane, bê pirtûkxane jî nabexwedî hêz. Rojê yek rûpel, mehê dike sih rûpel, salê dike sê sed û şest û pênc rûpel. Nîvê van rûpela be jî dewlemendiyek mezin e. Ku rûspiyêni me hewl bidin, binivîsin!...

Medenî FERHO

MEHÎN ÎLON û COTMEHÎ XEBATA TEYBETÎ Û BI BERHEM

Di mehîn Îlon û Cotmehî de xebata Enstituyê bi awayekî teybêtî meşî. Gotin û axaftin kêm bûn, xebata bi berhem xuya bû.

* Şevê agahdariyê li ser rewşa Kurdistan li bajarê Bruksel, Aalst, Gerardsbegen, Antwerpen û Leuven pêk hatin.

* Di vê navberê de jî *Komîteya Alîkariya Gelê Kurd* saz bû. Ev komîte ji aliye pênc parlementerên Beljîkî tê paraztin: Hugo Van Rompaey (CVP), Willy Kuypers (VU), Jef Sleenckx (SP), Hugo Van Dienderen (Agalev), (SP), Anny De Maght (VLD).

Çend rêxistinênu ku ev komîte bi hev re saz kirin: Enstituya Kurdî Ya Brukselê, Caritas Internationaal Hulpbeoton, V.I.C., Broederlijk Delen, Pax Christi, Forum Voor Vrede, VOS, Vrede, Rodenbachfonds û ABeCe-Noodhulp... hê jî ev komîte bi besdariya rêxistinênu mezin zêde dibe.

Armanca vê komîte di aliye politîk de agahdarî û daxwazên xwe ji civaka Beljîka re bide û ji dewleta Beljîka hêvî bike ku ji bo çareser kirina pirsa Kurdî roleke girîng bilîze. Komîte herweha xebatê dike ku alîkariya diravî ji penaberên Kurd re li Kurdistanê bide hev û bîghîne wan. Ev alîkarî bi destê Caritas li Kurdistan dighe penaberan.

* Heta niha hevdîtinêni cihê yên Komîte bi parlementer û şexsiyetên Beljîkî re çê bûne. Li ser vê komîte agahdariya zêdetir di nav rûpelên **Bultena Sêmehî Ya Enstituyê, hejmar 28-29de**, hatiye dayin.

* Enstituyê dest bi weşanek nuh, bi navê **Berichten van en over Koerden**, bi zimanê Holandî, kir. Ev kovarê mehane bê weşandin.

* Enstitu li Köln û Frankfurtê stendêne weşanen vekir.

* Du hevdîtinêni bi parlementerên Beljîkî re li ser pirsa Kurdish cî girtin.

* Di radyo û televîzyona Beljîka de du programên cihê de axaftin bûn. Di rojnameyên cihê de li ser rewşa nuh ya Kurdistan û xebatêni cihê (yên Enstituyê û Komîte) agahdarî hatin weşandin.

* Yek ji rojêni teybêtî ku li Enstituyê bihurt, ziyareta **Mikartî Markosiyân** bû. Roja pêncsemê, 17.10.1996, namzedê serokatiya bajarê Ecmieldzin-Ermenîstan, **M. Markosiyân** Enstitu ziyaret kir û bi wê munasebetê jî li ser rewşa nuh ya Ermenistanê û bi teybêtî li ser rewşa bajarê xwe û Kurdên li Ermenistanê bi besdaran re axaft. Paş axaftina wî besdaran jî gelek pirs jê kirin û bîr û baweriya xwe gotin.

Markosiyân soza vekirina programeke kurdî di radyo û televîzyona bajarê xwe de, amade kirina îmkanên weşana pirtûkên perwerde kirinê ji zarokên Kurian re û piştgiriya kurdan di hember nexweşiyen li Ermenistanêni di hember Kurdish de da. Hêvî ew e ku sozên wî bi cî werin.

RAGIHANDIN

Di hejmara 5 ya agahdarî de nûceya semînera birêz **Mustafa DÜZGÜN** ku li ser *Dîroka Nêzîwext ya Dêrsîmê bû*, hinek hevokên li ser peymana navbera *Şêx İdrîsî Bidlîsî û Yawuz Sultan Selîm* de ku nakokî û şkestîkên mezin êxiste navbera komên xelkê kurd de, weke ku fîkrê birêz **Mustafa DÜZGÜN** bûn tê xuya kirin. Hevok ev in: "Piştî van ragihandina jî birêz **Mustafa DÜZGÜN** li ser dîroka kevnar rawestiya, peymana di navbera *Şêx İdrîsî Bidlîsî û Yawuz Sultan Selîm* kire dabaşa mijara xwe û bal kişande ser doza 'qizilbaşiyê', ku ideoolojiye piir xerab û çewt ku têr nakokî û fesadî ye, heya îro jî di nava komên kurdan de roleke mezin dileyize." Mehest û armanca me ji vê gotinê ew bû ku wê siyaseta xerab, têr nakokî û fesadî ji terefê *Şêx İdrîsî Bidlîsî û Yawuz Sultan Selîm* ve amade bûbû, dûbendî di navbera komên xelkê Kurd pêk bînin e. Îro jî ew ideoolojiya xerab û têr ji teref dijminên kedxwer, yanî nebüşîrçirkê Yawuz Sultan Selîm ve bi kar anîn. Em vê şâşitiya xwe rast dikin ku birêz **Mustafa DÜZGÜN** bala besdaran li ser vê rewşa dijmin kişandiye û ji birêz **Mustafa DÜZGÜN** û xwendevanênu xwe bexşandinê hêvî dikin.

ZORDESTIYA DIJMIN JÎ ME HIŞYAR DIKE

Têmûrê XELİL

Helbesteke Çerkezê Reş heye: Şelmaqa gêografiyê". Ev helbesta wî çaxî kete bîra min. Gava ez û nivîskarê Kurd **İhsan AKSOY** ji Yêrêvanê diçûne ber bi gundêne me Elegezê, Sîpanê, Sengerê, Çilkaniyê... Ew gundana li bakurê Ermenistanê ne. 70 km. dûrî Yêrêvanê ne. Û eger em 7 km. ber bi başûr biçûna, emê bigihiştane gundê **İhsan**, Qerekosê, navça Agriyê, qeza Qersê... Lê çi mixabin, ku eva 70 sala zêdetir e dewleta Tirkî di navbera me de tixûb kişandiye, şelmaqa gêografiyê li sûretê me û Ermeniyan xistiye. Nahêle em bi hêsanî herine nava axa kal û bava. Wek ku kurdêne me dibêjin: "hela were vê ecêbê binêre...".

Ser neheqîya cîhanê hindava kurdan de gelek caran hatiye nivîsarê. Lê qet tiştek ber bi pakiyê ne hatiye guhertinê. Kizîn ji dilê min tê. Gava helbesteke **Ebdûle Paşew** dikeve bîra min: "Ji Kurdistanê diçime Kurdistanê, ji min paseportê dixwazin...".

Lê em çi bikin, qedera me ev e. Dijmin em hînî gelektiştan kiran. Em ji ber zordestiya dijmin diha hişyartır bûn. Her kurdekkî dilsoz, çend hezar kilometre dûrî welatê xwe, dixwaze bona milletê xwe karekî bike. Wek mesela me ku dibêje: "Kevirekî dane ser kevirekî". Di vî alî de dijmin idî nikare navbera me de tixûb û sînoran deyne. Ez **İhsan Aksoy** ji zû de nas dikim. Û di nava salêne hevnaskirina me de baweriya min çêbû ku, eger miletê min yekî weke wî daye, ango, berê ji, niha ji, paşê ji dikare bide. Û ew hemî bi hev ra dibine kevirê bingeha wî xaniyî, ku wê rojekê bibe mala hemî kurdan.

İhsan iro çû mala xwe (lê ne welatê xwe) Elmanya. Û min niha ûsa bêriya wî kiriye, weke ku bêriya birayê xwe dikim. Ji ber çi. Ji ber ku xwîna me yeke, kal-bavê me yek bûne. Ava me vexwariye, kilama me bihîstiye, yek bûye. Ji van hemî tiştan bîna miletê me û welatê me tê. Lê çî me ne yek e? Dînê me! Ji vê yekê ji bîna dijminê me tê. Ez bawer im, ku **İhsan** diha zef bêriya me kiriye. Ji ber ku eva çardeh salan e ne çûye welatê xwe. Û hesreta wan salan ji Ermenistanê kişand. Pareke êla wî-eşîra Sîpîkiya li vira dimîne. Erf-aded, rabûn-rûniştina welatê xwe li Elegezê ji dît. Ji qiseşebuhîriyên tevî kalemêre gund **Hiseynê Ahmed**, ji nanê destê **Fila** jîna wî lezeteke baş dît. Ji rasthatina wî ye tevî peyvkara (spîker) radyoya Yêrêvanê **Êznîva Reşîd** xortanîya wî kete bîrê, ku çawa temamîya rojê benda destpêbûna xeber danêne wê radyoyê bû. Dê û bavê wî ketine bîrê. Çû ber çiyayê Araratê sekinî û fikirî: "Hey felek! Rûhî min, dilê min li vî berî çiyê û wî berê çiyê ye. Lê canê min li

welatê xerîban e...". Û dilê **İhsan** wek wî çiyayî fire ye, rûhî wî ji wek wî çiyayî mezin e. Niha fikreke wî di guhê min de ye: "Ermenistan ne welatê Kurda ye. Lê ji pareke kurdan re bû ye welat. Lê Kurdistan welatê Kurda ye û kurd ne xwedî wê ne". Eva ji paradoks e. rastî ji Ermenistan bona me bû ye weten. Em bi Kurdî radibin-rûdinin. Bi Kurdî difikirin û distirêne. Bi Kurdî digirîn û şah dibin.

Kuncekî dilê **İhsan** rehet e. Bona karê şoreşeriyê û Kurdperweriyê ketiye hepsa, welatê xwe terikandiye. Du pirtûk bi Tirkî di derheqa gelê xwe de, miletê xwe bi sedan hezaran Tirkan û miletê mayîn daye hesandinê. Û dereca pirtûka wî ya bi navê "**Kilama Kurda**" ewqas bilind e ku Tirkzan, profesorê Ermenî X. Amîryan derheqa pirtûka wî de di rojnameya "**Rya Teze**" re gotareke delal nivîsi. Li Elmanya ew pirtû bi Elmanî ji hate çapkirin. Û gava rojnameya bi navê "**Kurdistan Press**" di nav rûpelên xwe de dest bi zincîra "**Helbestvan û Nivîskarê Kurd**" kir, pey **Şerko Bêkesê** bi nav û deng re ew yê duyemîn bû. Ku derheqa wî û afirandinê wî de ser du rûpelan xweş hatiye nivîsarê.

Derheqa wan hemû tiştan de ew bi xwe be's nake. Eger be's bike ji, bîr tîne ku çawa di hepsa Diyarbekrê de **Mehdi Zana**, Dr. Naci **Kutlay** û yên mayîn henek dikirin, şah dibûn. Ji wê min fêm dikir, ku girtin-hepiskirin bona wana şah bûn û serbilindî bû. Ji ber ku zanîbûn ku karekî Kurdperweriyê û dijî dewleta zeffker kirine.

İhsan li Ermenistanê rastî nivîskarê Ermenî yê herî mezin **Sero Xanzadyan** hat. Yê ku jê re got ku li ber mezinaya rûhî kurdan temene dibe. Jê derheqa dostiya Ermeniyan û Kurdan de gelek tişbihist. Ewê bibe bingeha romaneke xweş, ku emê ji zûtirekê bixwînin. Ew wisa ji rastî nivîskar **Wezîrê Eşo** helbestvan **Karlêne Çeçan** hat, çû redaksiyona **Rya Teze**, berpirsiyare wê **Emerîkê Serdar** re dûr û dirêj peyivî. Li Moskow bû mîvanê **Navenda Lîkolînen Kurdî**, serokê wê **Profesor Şekroyê Xudo** re qise kir û kîfa wî hat, ku li vira wê bi Rûsî û Kurdî di derheqa dîrok û literatûra miletê me de xebatê zanyarî, ji demên bihûrî ya herî kevnare hetanî bighe rojên me binivîsin û çap bikin.

Kurdêne ji welêt derketî bi dilekî xemgîn ji welêt derketine çûne şaristanan û ji bona rizgariya welatê xwe bi xurtî kar dikin. Ew hêvî dîkin ku bi dilekî baristan veerin. Ji ber ku rûhî wan û dilê wan li wir e. Li Kurdistanê ye!....

RENGİNİYA AHENGÊN MUZÎKA KURDÎ

Sêrgo

Her herêmek û her weha her bajarek li welatê me xwedî hin rûmet û ahengên teybêtî ye. Di nav avaniya muzîkê de texlîten cuda têne darî çav: *stran, dîlok, lawîk, şer, payîzok, heyranoğ,* ... Kêm kes hene ku hemî teybettendiya rîtm û awazê di muzîk û hunera li Kurdistanê bizanibe. Heta nuha stranêne ku hatine bihîstîn ne dilopek ji kahniya hunera Kurdî ye. Lê mixabin, berhemên herî dewlemend hê ji aliyê pirraniya xelkê Kurdistanê nehatine nas kirin yan ji buhayê wan ne hatiye zanîn. Ev ji kêmasyeke me ye ku em li ser narawestin. Di vê dabaşê de ezê çend tiştan li ser hin aliyêne bingeha muzîka li hin herêman rawestim:

Li navçeya **Botan, Behdînan, Şîrnex û Hekarî** em li qasî muzîkekê têne ku rîmta wê "sêcar e" û sêgavî tê gotin. Ji bo dîlanêne van stranêne ku ji pîvanêne sêdemîn in: *Ez Xelef im, Xelef im, hewar e Mîr hewar e/.....û ezê şer begê Bota me/ Her holê xweş, her holê hewar Mîr hewar e/Bû ring ringa daholê, hewar e Mîr hewar e/Şerr çûye ser Stembolê ez şer begê Bota me.*

Dîlana ku tê kirin li ser vê stranê sêgavî jê re dibêjin. Rîtm û iihewhatina laş û lingan guhdariyek nazik û teybêtî dixwaze. Li herêma **Mêrdînê** û devera **Qiziltepe, Dêrka Çiyayê Mazî**, li nav Omeriyan em pêrgî awayek xweser li bi kar anîna sazê têne ku bi "**Xurfanî**" tê bi nav kirin. "**Xurfanî**" texlîtek ji lêxistina sazê ye ku bê pirtik (mzrab) her çar-pênc tiliyê destê rastê têne bi kar anîn û li têlan serên tiliyan digindirin û têne pêçan bê nav ber bi pelandinek raxistî û saz kirî naveroka van stranen babetên civakî û evînî ne.

Rîtm "Xurfanî" sivik e, pîvana wê dudemî ye. **Xidirkê Omerî** nûnerekî saza **xurfanî** ye û li gelek berhemên ji vê texlîta muzîkê afirandiye û bûye beşek ji bexçê huneta Kurdî. Hin navêne stranê **Xurfanî** ji yê baş hatin nas kirin li navçê "**Sultanê dinya dem e, bazinezendê te me, gustîlka tiliya te me, xizêma pozê te me.**" De vêce wilo ji em dikarin di carêne bêne de li ser hin deverêne din rawestin û mûzîka wan nîşan bikin. Her çend e wê ne tevayî be ji lê dîsa belkî wek çîriskek ji bo xwendineke kûr û fireh be.

FERHENGA

ABORİ

MEDENÎ FERHO

amadekar:

Aborî:Ekonomî

Lêkolîna zanistî ya têkiliyên çandê

A. Etîmolojî:

Ev gotin cara yekemîn ji terefê hewngirê (feylezof) mezin yê demsala antîk Aristoteles ve hate gotin. Ekonomî (aborî) ji du gotinê Yewnanî, mal û destûr, yan jî rêvebirin, der ketiye. Mal=Oïkos, Destûr=Nomos.

Aristoteles, ev her du gotin bi kar anîne û cara yekemîn di nava komên xelkê û malbatan de sedema aboriyê di encama zanistî de anîye ziman.

Gotina **aboriya politîk**, cara yekemîn di sala 1615an de Montchretien bi kar anîye. (Montchretien, Traite de l'Economie Politique, 1615). Montchretien ev gotin di warê dewletî de ku dabaşa wî li **aboriya dewletê** bû bi kar anîye. Paş re ev gotin, di nava komên xelkê û mirovên zanist de, di holka (meydan) gelerî de, ya komaleyetî bo anîna ziman, hatiye bi kar anîn. Bi vê pêkanîn jî ev gotin beramberî **aboriya komaleyetî** (economie soaciale) cihê xwe li ser rêvebirin û tevgera komên xelkê kir, hin bi hin di nava xwe de şax û perr vedan. Lewra, holka aboriyê di hêla teknikî de cî de fizik, kimya, metalurji, matematik û zanistiya cotbarî û hwd.

Gotina **aboriya komaleyetî** (economie sosyal) di sala 1862an de ji terefê zanyarê Polonî Spunski hatiye bi kar anîn. Di dema îro de gotina **aboriya komaleyetî** di çarçeweya (Fr. Economie Politique, Al. Politiche Ökonomie, Wolkswirtschaftslehre, Ing. Political Economy, Economiks) û beramberî wan tê xilmet kîrin. Marksistî namdar Rosa Luxemburg di vê çarçeweyê de cara yekemîn **aboriya neteweyî** (Al. National Ökonomie) anîye ziman û bîrdoza xwe meşandiye.

Mixabin di nava komên xelkê Kurd de ku di her hêl û warî de tengezar maye, tevger û diristbûna civakî, bi zanîn û armanc tertûbelâ bûye ev şaxê zanistî, weke pirr şaxen din nehatiye xilmet kîrin, heger bi dev û ji sedema danûstendina çarçî û bazarên di kolan û bedestanên bajaran de, bi danûstendina xanan de ku bi rîya karwanan dihate pêkanîn, yan jî têkiliyên bi derive re ku warê karwanî de pêk dihat bûwibe jî, peyv û gotinê di literatûra aborî de bersiva wê dîtibin jî, di warê nivîskî de pêş ne ketiye. Helbet, sedemîn vê pirr in. Lî sedema darî çav û iro em dikarin bînin ziman: dijmin ne bes cih û war tenê bîriye, gotin û peyv, tol û nîrxen civakî jî ji xwe re birine. Iro ev tiştîn ku bi sedsalane ji teref dijminan ve têne xilmet kîrin û di pirtûk û jiyana wan û rojane de cihêن xwe girtine ji me kurdan

re biyanî tê. Mînak: Serwet!... Sermaye!... Mal!.. Mewdan!... Bazar!... Çarçî!... Bedestan!... û hwd.

B. Demsala Antîk:

Di hewngîriya Yewnanî ya berê de zanistî bi tenê di vî warî de mijûl bûye. Xwedayê gotina aboriyê (ekonomî) Aristoteles e. Aristoteles dîtiye û tê gihiştiye ku her mal xwedî du nîrxê xilmet kîrinê, yanî bikaranînê û nîrxê bi hev guhertinê, yanî kiriyarejî ji hevûdin cuda kîriye. Bilî vê, dîtiye û tê gihiştiye ku **selef rastmalê** hişk pere zêde dike, dike xwedî hêzek mezin, daxwaz kîriye ku **selef** bête qedexe kîrin. Aristoteles di bîrûbaweriya xwe

de ne terefdarê çanda ku beramberî hatinek rastmalî bête kîrin bû, ev kar dijî xweza didît û bi bêrûmetî şîrove dikir.

Digot gerek e biha rast be, ne zêde be. Li gorî wî bihayê rast û ne zêde (Fr. juste prix), keda mirovan e, ne nîrxê guhertina mal û fêda bazirgan bi tenê ye, yanî ked û guhertin di warê wekhevî de tê nîrxandin.

C. Roma:

Di nava tevger û avakirina civaka Roma de, ku ji destpêka şaristaniya xwe heya dawî li pey şaristaniya Yewnanî domandiye, di hêla aborî de tiştek ji tevger û avaniya aboriya Yewnaniyan ne stendiye. Bes di hêla cot û cotbariyê de, di teknika karûbarê erdê de **Cato û Varo** mîjîyê xwe mijûl kîrine.

Not: Ku em dêhnê xwe didine împeretorî û dewletê leşkerî, jiyanek têr qerqeşûn û tevgerek talanî, wêranî û daneheva ji demedoran heye. Avabûn mana li ser lingan di nava civakên wilo de katik û perçimên zildayî teva li ser koka serdestî û zordestiyê ye. Bê bingeh in, lî cihê ku kete destêwan de ê wan e!... Her tişt li gorî daxwaz û ramanê wan tê guhertin. Karê wan helandin û tefandin e!... Lewra jî ne aboriya Roma ne ya Osmaniyan li kîsî wan e... Ya demedoran e, lî ji wan re dibe mal. Ku em dêhnê xwe didine rewşa ava kirina Împeretoriyeta Osmaniyan jî, ne bes di hêla hûnandina seltanet û leşkerî de, di hûnandina aboriyê de jî dewlet girêdayê du tiştan e.

Yek: di hêla ax û erdê de, yanî mîrî û hêla dezgehîn çandê yên qumaş de girêdayê Kurdistanê ye. Di hêla bazirganî û serweta bi nîrx (zêr û hişk pere) jî girêdayî komên ne misilman e!... Di nava civaka Osmaniyan de dikandarî, atarî, bazirganî, karkeriya di dezgehan de, yan jî cot û cotbarî şermezariyeke pirr mezin bû. Ku em li dîroka Osmaniyan ya dawî û destpêka dewleta Tirkîye dinêrin, rastmaliya wan bi dest danîna ser malûmewdan, yanî serwetên xelkê yên ne misilman û ne tirk dest pê dike. Têkiliya dewletê bi komên xelkê re bi **teba**, yanî xwedî û bende (bi her tiştî xwe ve, mal û can malbûn) e.

Cot û cotbarî jî di dîroka wan de bi rewşa mîrî ye ku ew jî bes di nava Kurdan de heye. Sazî û dezgeh jî, heya rastmaliya neteweyî piştî ku **ittihadî** têne ser kursî û paş re ji destên bajar û xwedî sazî û dezgehê Kurdistanê der tê. Mixabin nivîs û destnivîsên van dezgeh û saziyan teva ne di destên zanyarên Kurd de ne. Di xeşîm û dolabên dewleta Tirk de ne. Gelê Kurd di hêla arşivan de belengazî û bêzariya xwe didomîne. Ne bes dewletêni dijmin, jiyana Kurdan li ku dera hebe di hêla bê arşiviyê de tengasî û pirsgirêkên mezin dibîne. Lewra jî, heya demek dirêj zanyarên Kurd nikarin di derheqa paşerojan de berhemên zanistî, têr statistik û reqeman bifermoyî (pêşkêşî) komên xelkê bikin.

D. Demsala Navîn:

Di vê demsalâ de li aboriyê bi armanca parastina rewşa lidarxistî, bi berçavikên olî hatiye nêrîn. Hewngirê namdar yê demsala navîn **Thomasê ji Aquino**, giraniya xwe daye ser têkiliyê aboriyê û sazî û dezgehê olî. Bal daye ku têkiliyê her du baskan bi hevûdin ve girê bide û xurt bike. Her weha ola Xiristiyanî wekheviya mirovan tîne ziman û dibêje, li ser wê baweriyê heya dawî diraweste, lê **Thomaê ji Aquino** koletiyê, yanî bendetiyê rast dibîne û diparêze. Berhevkirin û bidestxistina malûmewdan, rastmal pêwîst duibîne. Lê, pîvan û hinek tixûb û sînoran jî datîne.

Li gorî wî: "*Liqasî parastina rewşa komaleyetî*" bes e. Sîstema nîrxî pêşniyaz dike. Daxwaz dike ku her tişt li gorî nîrxê xwe be û bikeve bazarê. Her tişt li gorî nîrxê xwe ne pirr biha, ne jî erzan bê firotin. Bilî vê danûstendin gerek e qedexe be. Di vê demsalâ de sê merovênen zanist ku yek ji van di ola misilmantiyê de ye, di hêla aboriyê de gavêne mezin avetine. **Jean Buridanus**: Daxwaz kiriye ku nîrxê mal ne li gorî mirovên ku mal çêkiriye, yan jî difiroşe, li gorî hewceyiya komên xelkê bi giştî bête kifş kirin. Nîrxê diravan li gorî guhertina cewheran (kur) şâş dîtiye û ji hev cuda kiriye.

Daxwaz kiriye ku nîrx bihayê guhertinê ji teref dewletê bête pêkanîn û erê kirin. **Nicolaus Oresmius**, di pirtûka xwe ya li ser diravan di nîvisiye daxwaz kiriye ku aborî ji olê bête veqetandin, (wejartî) û azad bibe. Hewngirê misilman **Ibnî Haldûn**, di bûyer û pêkhatinê dîrokî de pêwîstiya xwezayî dîtiye û têgihiştiye ku andora mirovan li ser her tişti heye. Ji ber vê çendê jî di têkiliyê holka aborî de **liberalizm** xwestiye. Li gorî wî, destdirêjiyê dewletê ji holka aboriyê dijî bîrûbawerî û ramanê çarçî û bazarê ye û ev destdirêjî wê bibe birka pêşdeçûnê, herweha wê bibe dirrih û bikeve nav dest û lingêne xelkê de. Bilî vê gotiye, kêm kirin û daxistina heqê mehane yên karbendar jî wê bibe sedema nekarîbûna kiryariya hewceyiya malbatî. Ev bîrûbawerî bûye destpêk û rêzaniya **bîrdoza hêza kiryariye**.

E. Ronesans:

Ronesansê, di derheqa aboriyê de dîtin, raman û bîrûbaweriyênen cihê û nuh anîne meydanê. Ev nûjenî û cudatî li gorî *rewşa lidarxistina burjuwazî* ye. Ramanê rastmalî yê pêşî ya rêvebirê Protestaniya Frensizî **Jean Calvin** e. Merkantalîst û xwedîyê ramanê dewletî **Jean Bodin** û **fizyokrat** û xwedîyê ramanê cot û cotbariyê **Sully** pêşkeşîya van bîrûbawerîyan kirine. Cara yekemîn, ramanê nîrxê keda mirovan di aboriyê de ji teref **Calvin** ve tê diyar kirin. Vê bîrûbawerîya xwe jî bi xwedî ve girêde û dibêje "daxwazek xwedayî ye".

Bodin jî di dîrokê de cara yekem bi pêşniyaza rakirina koletî yanî bendetiyê diavêje masetê û li ser diraweste. Xwedîyê gotin û peyva **aboriya politîk**, **Antoine Montchretien** dîtinek û ramanekî pirr balkêş datîne ser maseta aboriyê. "*Bandora aboriyê bandora politîk jî bi xwe re tîne*". **Colbert** jî, bîrdoza bi navê xwe ku bi **Colbertizm** tê naskirin, berhimbêzkirina dijwar li Frensa bi bingeh û rêkûpêk dike. **Merkantilizm** jî di sedsalên XVI, XVII û XVIII an de dibe serkêşê polîtika aboriyê. Aborî di şaxê zanistî de azad, serbixwe dibe. Cara yekemîn di sedsala XVII de li bajarê **Napolî** dibe xwedî kursiyekî teybetî. Prof. Genovesî dibe serokê vî kursiyê şaxê zanistî ku nuh azad û serbixwe ye.

F. Aboriya hemdemî:

Aboriya modern di sedsala XVIII an de bi lîberalan dest pê kir. **Adam Smith** û **David Ricardo**, du navêne mezin û zansitên hêja ne ku bi rîya dibistana klasîk aboriya zanistî gihadine qonaxeke girîng. Aboriya **Marksist** li ser bingeha zanistiya van her du kesan hatiye ava kirin. **Aboriya rastmalî** di dibistana marjînalî de òer bi kesayetî çûye û bi navê dibistana klasî hatibe binavkirin jî, ji zanyariya klasik ya **Smith** û **Ricardo** û wê zanistiya bi hêz dûr ketiye. Paş re, zanyarê Ingilîzstanî **John Maynard Keynes** bi hewngîriyek nuh bûye xelasî û parêzgerê rastmaliyê. Íro, aborî di warê **metafizîk** û **diyalektîk** de ku hemberê hevûdin in pêş dikeve.

Hin peyvîn aboriyê ku têne xilmet kirin ev in: **Aboriya nîrê zêrîn** (Ing. Economy of abundance), **Aboriya xelâyî** (Ing. Economy of scarcity), **Aboriya politîk** (Ing. political economy), **Aboriya xelekî** (Ing. Economic System), **Aboriya rêkûpêk** (Ing. Economic order), **Aboriya sazbendî** (Ing. Economic council), **Aboriya bandorî** (Ing. Economic activity), **Aboriya şerrî** (Ing. Economic warfare), **Aboriya yekîfi** (Ing. Economic Union), **Aboriya budceyî** (Ing. Economic budget), **Aboriya plansazi** (Ing. Economic planning), **Aboriya pêşkeşî - tekemûl-** (Ing. Economic progress), **Aboriya şaxî** (Ing. Economic unit), **Aboriya pêkhafî** (Ing. Economic Sanction), **Aboriya lezî -xurt-** (Ing. Economic clause), **Aboriya rewşî** (Ing. Economic condition), **Aboriya paşkeşî** (Ing. Economic recession), **Aboriya başbûnî** (Ing. Economic recovery), **Aboriya dudîlî -bêqerar-** (Ing. Economic instability), **Aboriya rent** (Ing. Economic rent), **Aboriya hevgirî** (Ing. Economic integration), **Aboriya navendeyî** (Ing. Economic concentration), **Aboriya maliyetê** (Ing. Economic cost), **Aboriya pêşketinê** (Ing. Economic development), **Aboriya wekhevî** (Ing. Economic equality), **Aboriya seferberiyê** (Ing. Economic mobilisation), **Aboriya dengeyî** (Ing. Economic equilibrium), **Aboriya dor-serehî** (Ing. Economic expansion), **Aboriya pêwîstî** (Ing. Economic depreciation), **Aboriya neteweyî** (Ing. Economic nationalism), **Holka Aboriyê** (Ing. Economic field), **Aboriya serdestî -erk-** (Ing. Economic imperialism), **Saziya aboriyê** (Ing. Economic fondation), **Azadiya aborî** (Ing. Economic independence), **Aboriya newekhevî** (Ing. Economic friction), **Aboriya ahengî** (Ing. Economic harmonies), **Aboriya vedizînê**, ku ji bo dewleteke din erka xwe aborî li dar bixe tê gotin (Ing. Economic penetration), **Mirovê aboriyê** (Ing. Economic man), **Malêñ -mewdanen- aboriyê** (Ing. Economic goods)

Aborîmetrî

(Fr. Econométrie, Elm. Ökonometrie, Ing. Econometrics) Pîvana bûyerên aborî. Bi riya istatistîkan bûyerên aboriyê tîne ziman. Bi vê hewldanê jî destûrên aboriyê derdixe holê û pêk tînin. Pîvana aborî, ji matematikê fêdê dike û tê kirin. Di aborîmetri de, bîrdozêñ aboriyê û pirsgirêk bi formulêñ matematikî têne ziman...

Pêlêñ aboriyê

(Fr. Fuluctuations économicos, Elm. Fluktauation Konjunkturschwankungen, Ing. Economik Fluctuations, Cyclical Fluctuation) Di tevgera çandiya rastmalî de pêkhatinêñ dakin û bihewaketenê, encama hêdî û lezî. Ev pêl ji xwezayiya pêkhatinêñ tevgera çandiya rastmalî der têñ. Mînak: Di dema elektrikê de ku di hinek saetan de ronahî zêde dibe, di hinek saetan de ronahî korik dibe. Di vê encamê de pêlêñ zêde û korik heye ku sih-çil salî jî bi pêlêñ ne wekhevî berdewam bike. Pêlêñ rojane, mehane, salane, pêlêñ kin in... Dirêjiya pêlan ku di navbera sê û deh salan de bin, pêlêñ normal in. Pêlêñ ku dirêjiya wan sih sal û di ser re bin, pêlêñ dirêj in. Di mînaka pîvana **Kondratieff** de, sala 1780 bilindbûna pêlê 35 sal, berdewama dakinê jî 24 salan kişandiye. Di nava pêlêñ mezin de, pêlêñ kin û normal jî der dikevine holê. Dîroka tevgera korik û misrif ya rastmalî herî mezin di sala 1929 de pêk hatiye. Bêşensî û bextreşıya di vê bûyera mezin de, ji pêkhatina pêlêñ kin, normal û dirêj ku teva di yek demê de qewimî ne tê. Helbet ku bûyerek wilo bi pêlêñ bextreşıya hevreyî der tê meydanê malkambaxî jî bo rastmal jî pê re tê.

Pêşketina Aboriyê

(Fr. Développement économique) Guhertina encama çandê. Di berdewama dîrokî de her rengê çandê, *komî, xulamî, feodalî û rastmalî* di guhertina xwe de, bi encamek ji xwe bi hêztir re hatiye guhertin û dawî dîtiye. Ev gotin û peyv bi pêşketin û ferehbûna aboriyê tê şirove kirin.

Destûra Pêşketina Aboriyê

(Fr. loi de développement économique) Serastiya navbera hêzên çandê û têkiliyên çandî. Destûrên xweser, yên pêkhatina her sosyo-aborî (sosyo-ekonomik) hene. Lî, destûrên pêşketinê yên aboriyê di bûyerên sosyo-aborî teva de yek e. Ew jî: *Di navbera hêzên çandê û têkiliyên çandî de destûra wekheviyê ye.* Ev destûra giştî jî, weke destûrên aboriyê yên pêşketinê, xasletî ne. Ji bandora mirovan û mijûlayiya mîjiyê mirovan azad in. Ji teref mirovan têne zanîn û tê ne xilmet kirin (bikaranîn) jî, lê nayêñ guhertin. Ne têne çê kirin, ne jî têne guhertin û têne rakirin. Li gorî vê destûra aboriyê ya giştî, heyâ di navbera hêzên çandê û têkiliya çandî de wekhevî berdewam bike, pêşketina aboriyê pêk tê.

Pêşketina aboriyê pêşî di hêzên çandê de, di nava wan de jî di alav û haletêñ çandê de dest pê dike. Hê vekirîtir: pêşî alav û halet têne guhertin û pêş dikevin. Bo piştgirî û alîkariya vê pêşketinê hêzên çandê pêwîst e xwe bide guhertin. Yanî xwe li gorî vê guhertin û pêşketina alav û haletêñ çandê, pêwîst eku ew jî bêne guhertin û amade bibin.

Helbet alav û halet jî weke hêzên çandê pêwîst e ku ku bêne guhertin û pêşketî bin. Ku hêzên çandê di guhertin û pêşketinê de li pêşîya têkiliyên çandê bin -mixabin di formasyona dîroka sosyo aborî de hinekî jê wilo bûye-. Têkiliyên çandê di pêşîya hêzên aboriyê de asteng derxistiye û bûye pêşbirk. Yanî berpalk û piştgirê pêşketin guhertina hêzên çandê, têkiliyên çandê dikevine encama pêşbikî û astengî.

Mînak: Di dema xulamî (koletiyê) de pîvana hêzên çandê û têkiliyên çandê weke hev bûn, rewş pirr bi hêz, xurt bû û ber ber bio zêdebûnî diçû. Vê hêzbûn, xurtî û zêdebûnê alav û haletêñ nuh yên çandê der xistin holê.

Ev alav û halet jî di navbera xweda (efendî-xwedî) û xulam de kelem û asten der xistin. Xulaman pêça xwe neda van alav û haletêñ pirr biha û dişikandin. Ji ber vê yekê jî çanda aborî rawestiya, kete nava koriktiyê (buhranê) de. Bo ji vê devera teng der bikevin û van alav û haletêñ nuh bi xulaman bidin erê kirin, xwedayê rastmal, yan jî xwedayê warîdat (cih û war) an, dest bi demanê, yanî ji hatina salane pardanê kirin.

Hê vekirîtir em bêjin: Xulaman ji hatina salê par stendin. Wilo jî têkiliya navbera xwedî û xulam hate guhertin. Bi vê guhertinê ji formasyona sosyo aborî kete encamek nuh ya formasyona feodalîzmî. Xulam, bi demanek hindik be jî, kete binbariya zewiyan û cotbarî, xweda jî bi dana parek ji hatina salê, yanî demanê, ji xwedatî ket bû beg û axa. Van têkiliyên nuh, rê li ber pêşketinê vekir. Rewşa feodalîzmî bi demek dirêj xurt û bi hêz kir. Hêzên aborî bi xurtî ülezek neqam pêş ketin. Vê pêşketinê jî têkiliyên çandê yên nûjen pêwîst kir. Ew pêwîstî bû vekirina dergehê rastmaliyê. Ku heyâ îro jî berdewam e.

Têkiliya Aborî

(Fr. Relation économique) Bo jiyana komên xelkê, mirov pêwîstî çandê û di nava xwe de bela kirina vê çandê ne. Ji pêwîstiya guhertin û xilmet kirina (bikaranîn) teva re tê gotin. Engels di nameya ku di 25.01.1894 de ji **Heinz Starklenburg** re şandiye weha dibêje: "Teknîka warîdat û gihaştinê teva di nava wê de ye. Li gorî dîtinâ me ev teknîk, wê rengê hevguhertina warîdat û encama bela kirinê, herweha erkê û têkiliya xulamî (xulamî), dewlet û polîтика, dadî û hwd. teva nişan bike..."

Aboriya Mirovanî

(Fr. Economique Humaniste, Elm. Ökonomische Humanismus, Ing. Economie Humanism) Bîrûbaweriya rewşûa aborî ya pêşvebirina mirovaniyê û kêfxweşîya komên xelkê. Çandê ne li gorî menfaetê kesan, li gorî mirovaniyê giştî û di encamek wekhevî de bête pêkhatin, tîne ziman.

Malê Aboriyê

(Fr. Marchandise économique) Malê ku bi keda mirovan berdest dibe. Di *aboriya metafizîk* de bi gotin û peyva *malê serbest* tê bikaranîn. Li gorî vê baweriye: Av, hewa, roj û hwd. hewceyiya mirovan malê serbest e. Ev mal, heger bi keda mirovan serbest bibin, dibine **malê aboriyê**. Li gorî baweriya diyalektik ev dîtin şas e. Ji ber ku mal ji xwe aborî ye û tiştê ku ne aborî be ticarî nabe mal.

Hesabê Aboriyê

(Fr. Calcul économique, Elm. Ökonomischer Kalkul, Ing. Economic calculus) Di çandê û belakirinê de, bi mesrefen pirr hindigelek mal bidestxistin e. Ev hesab li ser bihayê mal tê girtin. Biha, mal û karê bidestxistinê û destxistina bazarê kifş dike. Biha jî, mal û kar û hejmara bidestxistinê tê kifş kirin. Li gorî vê rewşê, mirovên çandê pêwîstiya hesabekî aborî dibîne, mirovên xilmet kirin û kirinê jî pêwîstiya hesabekî aborî datîneber çavan. Her du bask, yek li fêdê zû ji derxistina mal digere, êdin jî li gorî hatina xwe û malbata xwe gavêne xwe diavêje.

Hewcetiya Aborî

(Fr. Besoin économique) Xwedî kirin, li xwe kirin, cîwar bûn hewceyiye aborî hene. Zanistê aboriyê Otto Sik, dibêje: *Tiştên pêwîst û ne pêwîst. Yek: hewceyiya aborî... Du: derî (ne) aborî...* Li gorî vî mirovê zanist nan, hewceyiya aborî ye. Piyano hewceyiye çandî (kulturî) ye.

Nirxê Aborî

(Fr. Valeur économique) Nirxê guhertinê. Nirx, diwarê aborîde ji nirxê zanistên din cuda dibe. Ji nirxê hunerî, zanistiya kesyetî, zanistiya tolê cuda ye. Mînak: Saetek ku kevin be, ji bav û kalan mayibe, nirxê wê bîranîn e, bi peyvek din, nirxê wê yê kesyetî xas heye. Lê ku kete holka bazarê, nirxê wê yê guhertinê, yanî danûstendinê ye. Li gorî vê encamê, tabloyek hunerî, alav û haletek pirr xas ku karekî hêja dikedikeve nava nirxê aborî de. Hêjabûn û nirx li gorî tiştan cuda dibe. Nirxê aborî jî bi bazar û bazirganiyê ve girêdayî ye.

Pîpinga Aboriyê

(Fr. Seuil économique, Elm. Wirtschaftsliche Schwelle) Tixûbê aboriyeke bi rêkûpêk. Ev pîpink, bi gotinek din ku ji pîpinge derbas bû rêkûpêkiya aboriyê tevlîhev xera dibe. Mînak: ku hikûmetek nirxê diravêne xwe dabixe, pîpinga aboriyê tevlîhev û xera dibe. Bihayê mal û mewdan bihewa dikeve, çarçiya reş kar dike. Ev gotin û peyv bi giştî tixûbê aboriyê tîne ziman, herwiha di gelek pêkhatinê aboriyê de jî tê bikaranîn (xilmetkirin). Mînak: Dema tixûbê danûstendina derive tê rakirin û danûstendina serbest dibe. Ev rewş jêderketin û pîpinga aboriyê ye.

Heremê Aboriyê

(Fr. Espaces économiques, Elm. Wirtschaftgebiete, Ing. Economic Spaces) Erka li ser heremê aborî. Li gorî zanistê aboriyê yê Frensiz François Perroux, iro, welat nakevin nava tixûbêne coxrafîk de. Mînak: Heremê di bin destê Amerîka Yekbûyî de bi giştî ji çaran sê ji cîhanê digirin.

Agahdarî bi her hejmara xwe re li ser babeteke teybetî çend rûpelan diweşîne.
Babetênu ku xwendevanêne me girîng dibînin û li ser wan xebat kirine dikarin ji me re
bişînin ku ew di nav rûpelê agahdarî de werine weşandin.

Weşanên Enstituya Kurdî ya Brukselê:

- Bultena agahdariyê, bi sê zimanen, kurdî, frensizî û holandî, sêmehî, ji nivîsarên çapemeniya Beljika amade dibe. Abonetiya salane 500 Fr. (25 DM)
- Agahdarî, mehane, bi zimanê kurdî ye, babetênu cihê tê de cî digirin. (Belaş tê belav kirin)
- Berichten van en over Koerden, mehane, bi zimanê holandî, li ser rewşa Kurd û Kurdistanê agahdariyan dinivîse. Goman heye bi Frensizî jî were weşandin. Abonetiya salane 250 Fr. (15 DM)

binêr... mezin dibim

pirtûka ku zarok ji his, hez, xwestin, xweş û nexweşiyêne zarok tê de dijîn di nêz de ji aliyê Enstituyê tê weşandin.
Ev pirtûk ji aliyê Zanîngeha Katolîk ya Leuven (K.U.L.) hatiye amade kirin û bi zimanê Holandî hatibû çap kirin.
Pirtûk ji axaftinêne zarok û resimên bi dest çêkirî pêk hatiye. Niha jî bi Kurdî tê weşandin. Hebûna vê berhemê di
her malê de pêwîstiyeke mezin e.

REWŞEN Ú REWŞENBİRİ

Bedirxan EPÖZDEMİR

Bê goman li her welatekî, di her qonaxî de rewşenbir xwedî roleki teybetî ye. Qanax çi dibî bila bibî pêwîst e rewşenbir, sînga xwe bike şûr û mertel dijê zordestî û niheqiyân bê westan bisekine. Destûr nede kîrinê qirêj û gemar. Ku tewanberî û zîndan benda wî bin jî ew bê tîrs herê ser bûyerên kevnar û zengar.

Ciyê rewşenbir li nav refîn gel e. Pêwîst e di nav sazî û dezgehê gel de ciyê xwe bigre. Daxwazîn gel bê şik pêk bîne. Gel bi rewşenî bixemlinê û bibî awaz û gaziya gel.

Lê qeyd û bendê koletiya salan, paş ve mayîn dijwariyeke herî kambax e. Tu bivê nevê bandora xwe li ser rewşenbiran jî dide xuya kîrin. Rewşenbir jî endamekî wê civatê ye. Di her warî de ew jî para xwe digrê. Sedem ku rewşenbir xwedan roleke teybetî ye. Wê demê jî pirs di her alî de girîngit dibe. Gelek caran jî li gora dîtina min rexnê hişk û sik hiltîne. Her wek guneh jê re têne nivîsandin.

Pêwîst e em qedir û qîmeta rewşenbirê xwe baş bizinan. Wana rencîde nekin. Tişîn ku em ji militanê partiya xwe dixwazin em nikarin ji wana bixwazin. Barê ku ji bin der ne kevin daneynine ser milen wan. Em mecal û zemîna ji wana re nas bikin da ku ew û em lmayiqê gelê me yê hêja bin.

Rewşenbir jî gerek e ji xewa giran şiyar bibe. Xwe bihejîne û bê ser xwe. Berpirsiyari û pêwîstiyênen xwe yên rojane pêk bîne. Ji dûwerojan re xwe amade bike.

Barê rewşenbirê Kurd girantir e. Bê goman ew jî ji pirsgirêkan para xwe hil dide. Ew ne bê alî ye. Ciye wî refîn gel e. Her pîrsa gel wî ji nêzîkayî ve elaqedar dike. Pêwîst e ku ew ji rîexistinê gel yên siyasi re bi rûmet be. Lê ne ku ew di navbera wan de aliyeke bigre û dijminatiyê ji aliye din re bike. Divê ew azad be. Li gor bîr û baweriyênen xwe bikeve nava rîexistineke siyasi. Di nava rîexistina siyasi de jî divê ew wezîfeyen xwe yên rewşenbirî ji bîr neke. Tim û tim hewl bide ji bo pirsgirêken di navbera hêzîn gel de û bikare bi wana bipiştive. Lê bikêrî sazî û dezgehê xwe yên rewşenbirî were. Xwedî inîsiyatîf be. Dengê gelê xwe ji cîhanê re bide bihîstin. Li koşeyekê rûniştin û dengbêjiya bi tenê nabe. Dengê rewşenbirî tenê çiqasî xweşbe jî têra pîrsan nake. Pêwîst e kîfa wî ji pîrrdengiyê re bê. Aşîxwaz û demokratekî bi rastî be. Dijî xwînrijandinê be. Birakujiyê qebûl neke. Mêjî zelal be. Bi tu cî ve endeks kirî nebe. Pêwîst e bikaribe li ser lingênen xwe bisekine. Sofî û mirîdê wî alî yan aliye din nebe. Divê ji bîr nebe ku gelê me ji sofîti û mirîdiyê pîrr kişandiye. Bi bawerî be û hîngâ bibe misilman. Pêşîya rastiyê ber nede û xeletiya biqewirîne. Ev kîrin û çalakî riya gel ronahî û rewşen dikin.

Meriv dikare bi rojan li ser rewşen û rewşenbiriyê qise bike. Lê bi ya min nasandin yek e. Rewşebîr jî ne erzan û hêsa ye. De werim em bi mejiyekî nerm û zana berpirsiyari û pêwîstiyênen xwe bînin cî.

BÊDENGÎ MIRINA REWŞENBİRAN E

(Li ser daxwaza Medenî FERHO)

Feqîr AHMED

Dema rewşenbirê Kurdistan bêdeng bimînin mirina wan e. Ku rewşenbirê Kurdistan bi mêjîyê xwe yî fereh û nûjen li ser doza Kurdistan binivîsin wezîfa xwe pêk tînîn.

Rola wan ew e ku bi bîr û bawerîya xwe, bi nivîsanen xwe, bi pêşîniyaren xwe û bi rîzaniya xwe rîya rîzgariya gelê xwe pêşan bike. Welew di nava rîexistineke siyasi de jî cî girtibe divê ew gelemperi bifikre. Her nivîskar, yan jî rewşenbir, divê ku berhemênuh ji xelkê re bi pêñusa xwe pêşkêş bike.

Îro, rewş û şertîn li Kurdistan pirr û pîrr dijwar in. Ne her kes dikare bibe welatparêz. Her nivîskar û rewşenbir jî wezîfa xwe bi cî nake. Gelê me di bin zîlm û zora dijmin de dinale. Lê dîsa bi cesareteke mezîn serrî li hember dijmin hilda ye. Şerrê mirin û mayînê dike. Bindestiyê hew dixwaze. Li welatê xwe, jîneke azad û serifraz dixwaze.

Wezîfa kesen qeleme digirin ew e ku vê rewşa dijwar, lê bi hêvî, binivîsin. Ders û aqil ji bûyeran derbixin û nîşanî gel bikin. Ji pêşerojê re tim ronahî bidin. Cîhana dervayê Kurdistan ji pirsgirêka Kurdi agahdar bikin. Hevalbendan zêde bikin. Dinya li dijmin tengkîrin karê wan e.

Rewşenbirê cîhanê aliyê gelê xwe girtine, di rewşa dijwar de bi gelê xwe re dengê xwe kirine û ji bo menfaetê gelê xwe canfedayî bûn. Ji refîn xelkê xwe re bûne mîna çira. Bi vê yekê jî ew bûne xwedî şexsîyet. Picasso bi resimên xwe. Sartre bi zanebûna xwe ya filozofiyê. Meriv dikare Viktor Hugo, Maksim Gorkî, Marquez, Paulo Freire, Hugo Claus, Havel û sedan kesen din ji cîhana rewşenbirê derve mîna nîşanî bide. Ahmedê Xanî, Cigerxwîn, Qenatê Kurdo, Celadet û Kamûran Bedirxan, Hejar, Dr. Nûreddîn Zaza jî ji nav me kurdan çirayen me bûn.

Dil dixwaze rewşenbirê Kurd yên vê demê jî wezîfeya xwe bê kîmasî wek mînaka van kesen jor bi cî bikin. Rewş û imkan jî hene. Dil bixwaze her tiş mimkin e. Gun, dîn Kurdistan dişewitin. Wêran dibin. Refîn gel hew dizane bi ku de bireve. Dijmin zor û zîlma xwe xurttir kirî ye û jiyan dijwar kirî ye. Hêzîn me yên siyasi jî bi nav hev ketine. Rewş ji her alî ve perîşan e.

Gelo ujdan qebûl dike ku ev gelê kevnare, xwedî çand û dîrokeke kevn, welatekî ji hemî waran ve zengîn, bê xwedî bimîne û li ber lingan here? Bê goman, kes nikare bêje ku bersiv erê ye. Lê piçekî xîret lazim e û xebateke hê xurttir ji nivîskar û rewşenbiran tê xwestin. Xaseten kesen li derveyê welêt dikarin gelek tiştan bikin. İmkan û fersend hene. Ew dikarin her rastiya Kurdistanê li temamiya cîhanê bi pêñusa xwe bidin nasandin dînyayê li dijminê gelê Kurd teng bikin. Ji ber ku doza gelê me dozeke heq e. Dema weha bî ewê rewşenbir jî layiqê navê gelê xwe bibin.

ZIMANÊ BI SERÊ XWE MAYÎ

Mihemed QAWAS

Wekî diyar e, ku zimanek bi serê xwe bimîne, ew xurt nabe û nikare pêş ve biçe. Di dema me ya îro de li hemî cîhanê gelek netewan zimanê xwe pêş ve birine û gihadine qonaxeke ku gel jî wî zimanî tê bigihêje. Lê zimanê me Kurdan wekî wan ziman an pêş ve ne çû ye. Di wî warî de gelek sedem hene ku mirov dikare bîne ber çavan, lê ez bawer im ku êdî gelê Kurd bi van sedeman hisya ye, ne pêwîst e ku mirov dirêj li ser rawestê. Lê dîsa jî bi kurtî ez dixwazim çend sedemîn ji van sedeman bînim ziman:

1. Zimanê Kurdi ji demeke dûr û dirêj e ku dagîrkerê Kurdistanê ne hiştine zimanê Kurdi pêş ve biçe.
2. Kurdan bi xwe jî di warê xurt kirina ziman de xwe ne êşandin e û giraniya xwe nedane ser ziman. Zimanê bi serê xwe mayî ev e. Herweha ev ramanen ku li jor derbas bûyî di dema me ya îro de ji hînek bingehan hatiye holê. Di vê demê de divê hemî tiş bi şoreşê ve girêdayî be û di vê ahengê de xwe bilîvîne. Li aliyeke, mirov bala xwe dide xwe, livandina şorîşê Kurdi, mirov xwe tewanbarê paş de mayînê dibîne, li aliyeke din mirov dibîne bê dengebûnek di navbera şorîş û wêjeya Kurdi de heye divê ev tiş ji hev û din were zelal kîrin, ku ne weha be pêşveçûn çê nabe. Bi bîr û bawerîya min be di vê mijarê de çiqas dezgeh û saziyên Kurdistanê hene li ser zimanê Kurdi gelekî xwe bişînîn û vî mîjîyî bi xwe bişînîn û vî mîjîyî bi xwe bidin pejirandin. Heger mirov li pêşeroja rojêen Kurdistanê temaşe bike û bîne ber çavênen xwe, kar û xebata îro hatî kîrin û hîn jî tê kîrin ne besî pêşeroja werê ye, di vî warî de ez gelek mixa me ku, bi teybetî siyaseten Kurdistanê giraniya xwe nedane ser xebata ziman û bi nirxandin nedane. Lê di vî warî de ev bar disa li ser milen nivîskarê Kurd dimîne. Pêwîst e ew jî xwe gelekî xwe bişînîn û gavênen zexm biavêjin. Li ser vî bingehî di van salen dawiyê de gelek sazî û dezgehê Kurdistanê hatine damezrandinê û li ser çand û wêjeya Kurdi xebatê dîkin. Lê ew jî xwe nikarin bigihînin qonaxeke giştî û pêşveçûneke xurt, ew jî li ser hînek bingehêن hasas ji hev û din dûr in û di nava nakokiyê de ne. Di vî warî de ez çevîndarê hêviyek mezîn im ku, di hemî war û karan de gelê Kurd xwe bigihîne hev û din û di her warî de karîbe, bi hev û din re kar û xebatê bike. Bi ev raman û beyanen min li jorê dane diyar kîrin va dibê mirov bi mîjîyekî azad û bi fradeke (wîre) serbixwe mijûl bibe û berpirsiyariye li ser xwe his bike. Bi daxwazan, bi hêviyana, kar û xebat kîrin di hînek demen safi kîrin de tê kîrin, nikare bêhtir pêş ve biçe û pêşî lê tê birrîn. Lê ku xebat ji bo her û tevayî were kîrin tiştek li pêşîya wî nikare bibe asteng û qet ti caran pêş ve çûn ranaweste.

WEŞANA PIRTÜKÊN KURDÎ LI SOWYETISTANA BERÊ

Wezîrê ESO

Salên 30î li Ermenistanê xên ji pirtükên şâîr û nivîskarêñ Kurd, yê ku bi destê wan bi zimanê zîmkâî, yê Kurdî hatibûn nivîsarê usa ji lîteratûra wergerandî (tercûma) hate nivîsandinê. Ew payê pirrê esirandinê şâîr û nivîskarêñ Ermenî û Rûs bûn, yê ku ji aliye şâîr û nivîskarêñ Kurdan de, bi meremêñ pêşde birin û tam kirina zimanê Kurdî yê lîteratûri, Lê uwa jî dewlemend kirina lîteratûra Kurdî, hatibûn wergerandinê. Berî gişka ew esirandin, ew pirtük werdigerandin ser zimanê Kurdî yê ku derheqa jiyana gelê Kurd bûn. Yan jî mîrxasên wan Kurd bûn. Usa jî ew berhemêñ nivîskarêñ Ermenî hatine wergerandinê yê ku şâîr û nivîskarêñ Ermenî li ser bingeha berhemêñ folklor, zargotina Kurdan nivîsî bûn. Lê carna jî ew berhemêñ nivîskarêñ Ermenî û Rûs dihatin wergerandinê û weşandinê yê ku aliye bedewetiyê, hostatiya nivîsarê de yên tam û ser dereca bilind bûn. Lîteratûra wergerandî ji bo xwendevanêñ Kurd lazim û ferz bû. Yek ji sebeban jî ew bû ku lîteratûra Kurdî ya Kurdêñ Sovyetistanê pirr kesîv bû. Pirtükêñ Kurdî xwestina xwendevanêñ Kurd tam razî ne dikir. Bi berhem, bi pirtükêñ wergerandî pirtûkxana Kurdî dihate dewlemend kirinê. Ji şâîr û nivîskarêñ Ermenî, di salên 30î de herî zef berhemêñ nivîskarê herî mezin **Hovhannês Tûmaniyâ** li ser zimanê Kurdî hate wergerandinê. Sala 1932a bi wergerandina **Heciyê Cindî** û **Emînê Evdal** çîroka **Tûmaniyâ** ya bi sernîvísa "Gîkor" hate wergerandinê. Sala 1934a bio wergerandina **Rûben Dîrampiyan** poêma **Tûmaniyâ** ya bi navê ya bi navê "Anûş" hate weşandinê. Salekê şûnda du berhemêñ **Tûmaniyâ** yên dinê bûne malê xwendevanêñ Kurd: "Se û Pişîk" bi wergerandina **Casimê Celîl** û "Kalikê Gabo Çawa Kurmikê Hermûş Digihîne", dîsa bi wergerandina **Casimê Celîl** hatin weşandin. Lê sala 1936 bi wergerandina **Casimê Celîl** berhemêñ **Tûmaniyâ** yên bi navê "Berhevkirina Kilaman" û "Xwedî û Xulam" ji hatine weşandinê. Pişî salekê **Casimê Celîl** ji xwendevanêñ Kurd re dîsa ji **Tûmaniyâ** "Axiriya Xirabiyê" û "Nezerê Mîrxas" wergerandin û weşandin. Nivîskarê Ermenî **Hiraçiya Koçar** dost û xêrxwazê gelê Kurd bû. Bese ku em bêjin redaktorê rojnameya kurdi "Rya Teze" yê pêşin **H. Koçar** bû. **Heciyê Cindî** çîroka wî ya "Xecê" wergerande Kurdî û sala 1935 da weşandinê.

Di salên 30î de usa jî berhemêñ van nivîskarêñ Ermenî hatin wergerandin û weşandinê: **H. Şalciyan** "Rya Teze" (şano), bi wergerandina **Heciyê Cindî**, **Sîras** "Memê û Eyşê" dîsa bi wergerandina **Heciyê Cindî**, **H. Şalciyan** "Di riya dewlemendbûnê de" (şano) bi wergerandina **Heciyê Cindî**. **Sîras** "Letîfe" bi wergerandina **Cerdojê Genco** û **Emînê Evdal**, **H. Şîraz** "Siyabend û Xecêzerê" bi wergerandina **Casimê celîl** û **R. Dîrampiyan**. Xînko Aper "Mîşka Pişîkêra Çawa Şer Kirin" bi wergerandina **Casimê Celîl**. Salên 30î çend berhemêñ şâîr û nivîskarêñ Rûs jî bo zimanê Kurdî hatine wergerandinê. Mîna **Lev Tolstoy** û **Alexander Puşkin**. Wan salên 30î pirtükêñ klasîkên ilm û zanebûna marksîzmê û lenînîzmê hatin wergerandin û weşandin. Berhem û xebatêñ serokêñ partiyê û hikûmetê ya Yekitiya Sovyeta berê û Ermenistanê jî bo Kurdî hatine wergerandin û weşandin. Di nava

wan de ciyê herî ber bi çav pirtükêñ **Stalin** digirtin. Ew jî xwestina demê bû. Bi wan pirtûka di nava karkeran de propaganda û pesnê sosyalizmê û komunîzmê dihate kirin. Rast e, di nava zemanê bihuri de sercema wan kemala xwe, fîrbûna xwe hunda kirine, lê di wî zemanî de wergerandina wan zimanê Kurdî, yê politîki dewlemend kir. Di nava pirtükêñ Kurdî de ciyekî ber bi çav û muhîm pirtükêñ dersan ji bo xwendegehan cî digirin. Salên 20î û xasma salên 30î li ermenistanê hemî gundêñ Kurdan xwendegeh vebûn. Li Êrêvanê xwendingeha pedagojiyê bi zimanê Kurdî hatibû vekirin. Li wira dersdarêñ ji bo xwendegehêñ Kurdî dihatin amade kirin. Lazim e em li vira kîş bikin ku di salên 30î de li dora çil gundêñ Kurdan li Ermenistanê xwendegeh hatibû vekirinê. Li wan xwendegehan dersêñ hemî zanebûnan û ilman bi zimanê Kurdî didane zarakan. Ev destanîneke mezin bû. Di nava Kurdan de ev bûyer ji bo pêşde birina zimanê zîmkâî gaveke girîng bû. Ev hemî kar bi destê dewletê û bi mesrefen dewletê dihatin kirinê. Şagirtêñ wî zemanî hetanî van salên dawî jî name ji merivêñ xwe ra, ji pismamêñ xwe ra bi Kurdiya bi tîpêñ latînî dinivîsîn. Şagirtêñ wê dewrê pirtûka Kurdî diha bi hizkirin dixwînîn ne ku zilam û keçen kurdan yên niha. Bi kurtî, bi saya van pirtûkan, van dersêñ bi zimanê Kurdî zarokêñ kurd akil, tama zimanê kurdî yê lîteratûri hildan, temandin. Ev kerem tu zemanî ji bo Kurdan ne li welêt, li Kurdistanê, ne jî li derveyê welêt çê nebûye. Pirtükêñ dersan yên ziman û lîteratûra Kurdî bi detsê nivîskar û zanayêñ Kurd dihatin çê kirin û weşandinê, lê yê zanebûn, pîrîdmîtêñ dinê ji zimanê Rûsî û Ermenî werdigerandin ser zimanê Kurdî. Vê derecê de kartekî égin wan dersdar û zanayêñ Ermenî jî dikirin yên ku Kurdî weke zimanê Ermenî yê zîmkâî dizanîn.

Me gotiye ku pişî çêkirina Alfabeýa Kurdî ya bi tîpêñ latînî (sala 1929) dest bi hazır kirin û weşandinâ pirtükêñ dersan yên bi zimanê Kurdî bû. Hema wê salê du pirtükêñ dersan hatin weşandinê: **Maragûlov** û **Erebê Şemo** "Xu-Xu Hînbûna Xwendin-Nivîsara Kurmancî", **Marogûlov** û **R. Dîrampiyan** "Zimanê Kurmancî". Paş re nivîskar û zanayêñ Kurd dest bi hazır kîrn û weşandinâ pirtükêñ dersan, yên bi ziman û lîteratûra Kurdî kirin. **Heciyê Cindî**, **Emînê Evdal**, **Cerdojê Genco**, **Casimê Celîl** ji van navan in.

Salên 30î pirtükêñ Kurdî usa jî li peytextê Azerbeycanê, Bakû û li Peytextê Turkmenistanê, Aşxabatê dihatin weşandinê. Lê eger li Yêrêvanê pirtükêñ Kurdî yên şâîr û nivîskarêñ Kurd bûn û paş re yên dersan, li Bakûyê û Axşabendê her tenê pirtükêñ dersan dihatin weşandinê. Ew pirtük ji bo zarokêñ komara otonom, ya Kurdan li azerbeycanê, Kurdistana Sor û Kurdêñ Xorasan li Turkmenistan, li başûrê Aşxabendê li ser sînorê İranê dihatin weşandin. Pişî salên 30î weşandinâ pirtükêñ kurdî li Azerbeycanê û Turkmenistanê hate birrînê. Ü heta niha jî pirtükêñ Kurdî li wan komarêñ sovyetistana berê hew (ne) hatin weşandinê. Her tenê li Ermenistanê qedaxa ser weşandinâ lîteratûra Kurdî ya sala 1937a hate hilanînê û ji salên 50î li wira dîsa dest bi weşandinâ pirtükêñ Kurdî bû.

(dom dike)

NÜDEM BERHEMEK NUH XISTE NAV ARŞÎVA KURDÎ

Di vê dema dawî de pirtûkek nuh ji weşanxana **NÜDEM** giha xwendevan. Nûdem **WERGER** navê wê pirtükê ye û ji serî het dawî wergerên berhemêñ nivîskarêñ cihê ne. Kesên ku dixwazin ji **Tolstay**, **Marques**, **Puşkin**, **Y. Kemal** û bi dehan nivîskarêñ di yên xwedî nasîneke navneteweyî bi zimanê Kurdî bixwînin, dikarin ji navnîşana **NÜDEM** pirtükê temîn bikin. Agahdarî xebat Nûdemê ji dil pîroz dike.

agahdarî

Weşana
Enstituya Kurdî
Ya Brukselê

Berpîrsiyar: **Medenî FERHO**
Redaksiyon: **Kerîm BAQISTANÎ**
Wezîrê ESO - Ejder MEHEMED
Tel. 00 32 (0)2 230 89 30 - 230 34 02, Fax 00 32 (0)2 231 00 97

Navnîşan:
16, rue Bonneels
1210 Bruxelles - Belgique

Nivîskar
berpîrsiyarêñ
nivîsîn xwe ne